

T ê k o ş e r

Hejmar 42

Kanûn 1988



Revue trimestrielle kurde

N° 42

Driemaandelijks Koerdisch

Têkoşer : Kovara Têkoşer, yekitiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljika
Navnîşan : rue Bonneels, 4 - 1030 Bruxelles
Navnîşana Postê : B. P. 33 - Zellik
Tel : 02/230.89.30
Buha : 50 F.B.
NO bankê : 426-3144071-85 - K.B. - Belgique
Berpîrsiyar : M. Nezih Yalçın
Komîta nivîskariyê : Derwêş, Nezih, Pervin

N a v e r o k

Dr Nûreddin Zaza wefat kir	Pervin	3
Nijadkujîya kurdî li Parlemanta Ewropa		4
Rêzimana kurdî (XV), Tewandin (2)	Celadet Bedir Xan û R. Lescot	5
Sêwiyên cihanê	Jean Pascal Zanders	10
Dîroka Kurdistanê di Ansiklopêdiya Islamê de (XV), Zargotin û bêje		14
Cîrokeke xeyalî : Nedi û Danestan	S. B. Sorekli	20
Helbest : Verşandin, Xwendin	S. B. Sorekli	22
Têkdana nexşeya Kurdistanê		23
Mesele û metelokên kurdî	Berhevîkirin : O. û C. Celil	24
Xebata me		26

S o m m a i r e

Décès de Dr Nouredine Zaza	Pervin	3
Le génocide kurde au Parlement Européen		4
Grammaire kurde (XV), La déclinaison (2)	Dj. B. Khan et R. Lescot	5
Les orphelins de l'univers	Jean Pascal Zanders	10
L'histoire du Kurdistan dans l'Encyclopédie de l'Islam (XV), Folklore et littérature		14
Une histoire imaginaire : Nedi et Danestan	Ch. B. Sorekli	20
Poèmes : Nausée, Lecture	Ch. B. Sorekli	22
Destruction de la carte du Kurdistan		23
Proverbes kurdes	Recueil : O. et Dj. Djelil	24
Nos activités trimestrielles		26

I n h o u d

Dr Nouredine Zaza is overleden	Pervin	3
De genocide op de Koerden in het Europees Parlement		4
Koerdische spraakkunst (XV), De verbuiging (2)	DJ. B. Khan en R. Lescot	5
De wezen van het universum	Jean Pascal Zanders	10
De geschiedenis van Koerdistan in de Encyclopedie van de Islam (XV).		14
De folklore en de literatuur		14
Verhaal : Nedi en Danestan	Ch. B. Sorekli	20
Poësie : Walging, Lektuur	Ch. B. Sorekli	22
Schending van de kaart van Koerdistan		23
Koerdische spreekwoorden	Verzameling : O. en Dj. Djelil	24
Onze driemaandelijksse activiteiten		26


ISSN 0773-3887

fppb

Membre de l'Union des Editeurs de la Presse Périodique

Nûreddîn Zaza wefat kir

Pervin



Edi hemî xwendevan dizanin ku Dr Nûreddîn Zaza di 7.10.88 de, li Lozanê, Suîss, wefat kir, xwe gihand rêza ronakbîrên ku, weka wî, di destpêka vê sedsalê de ji stema (zulm) Atatürk re-vîyan û pena bûn (iltica kir) Sûriyê û, li wê derê, yan li Ewropa, piştî xebateke giran û bê dawî, yek bi yek vemirin û dilê me birdîndar û sikestî hîşt.

Hemî rojanme û kovarên kurdî vê bûyera gelek xem-gîn weşand û li ser jîna Nûreddîn agahdariyan dan.

Ji bo ku kovara me sê mehî ye, mixabin, em di vê agahdariyê de dereng man. Loma, em pêwîst nabînin ku em bi hûrî li ser jîna Nûreddîn rawestin. Lê, bi vê hincetê (munasebet), min dixwest ku ez van çend

higotinên jêrin binivîsim :

Dema ku Nûreddîn dijiya, gelek kêr Kurd pêwendiyên xwe pê re dikirin, lê piştî mirîna wî hemî rojname û kovar li ser xebata wî ya gelek hêja û stem û êskenceyên ku wî di zindanên cihê de kişandi bûn nivîsin. Ev tişt ji bo Cigerxwin, Kamuran Bedir Xan û yên din ji ewha bû. Dibe ku ev dîrketin ne bitenê sûcê Kurdan be, lê yê van ronakbîran bixwe, ku nizani bûn xwe nêzîkî wan bikin, be. Lê tiştê ku her gav min gelek dêşîne ew e ku dema ku ronakbîrek di jîyanê de be, yan em bicarek xwe jê dîr dixin û behsa wî nakin, ango wî dikin "tabû", yan jî em bitenê rexneyên gelek hişk lê dikin, ango tu tiştêki pozîtîf di xebata wî de nabînin. Lê piştî mirîna wî, em jî xeynî aliyên wî yê

baş nabînin ! Em pesna wî û xebata wî dikin ! Ev yek dil û moralê ronakbîran gelek dişikîne, ji bo ku ew xwe tenê, ji gelê xwe dîr, dibîne û tu feyde ji xebata xwe nabîne.

Tu xebat, eger ew rêzani yan çandî be, bê piştgiriya gel û nêzîkbûn û hezkirina hevalan tama wê tu neye. Ez vê yekê ne ji bo çîrisina navê vî hundermendî yan vê şexsiyetê dibêjim. Lê gava ku gelê me xwedi li kesên ku temenê (umr) xwe dane pîrsa kurdî û ku bi saya êş û şewata dilê xwe tiştan diafirînin dernakeve, ew di tenhayîya xwe de hêdi hêdi vedimirin û tam di jîne de nabînin. Gesbûna tevgera me girêdayî gesbûna dilê me ye. -

Nijadkujiya Kurdî li Parlementa Ewropa

Di mējuya (Tarix) 14/9/88 Strasbourg, nijadkujiya Kurdî ji pirsra Kurdî re xwest. Em de, Parlementa Ewropa, di li Kurdistana Iraqê, bi xurtî li jêr metnê vê protêstoyê bi civîna xwe ya giştî de, li mahkûm kir û ditina çarekê Ingilîzî diwesînin.

RESOLUTION

on the Iraqi offensive against the Kurds

The European Parliament,

- A. whereas, after the cease-fire between Iran and Iraq, the Iraqi army is pressing ahead with the extermination of the Kurdish population of Iraq,
- B. whereas these attacks against the Kurdish people have resulted in the slaughter of thousands of civilians and the destruction of thousands of Kurdish villages,
- C. having regard to the fact that Iraq is using chemical weapons to exterminate the Kurdish population and this has led to the atrocious deaths of thousands of civilians and verges on genocide,
- D. having regard to the mass exodus forced on the Kurds from the North of Iraq, who have fled to Turkey,
- E. shocked at the attitude of the Government of Iraq, which is deliberately ignoring the warnings and condemnations of the international community calling on it to abandon the use of chemical weapons,
- F. having regard to the results of the inquiry conducted at the request of the United Nations,
- G. whereas actions of this kind cannot be passed over in silence without detriment to international law and order,
 1. Condemns the repressive means used against civilian Kurdish populations in Iraq and, in particular, the use of chemical arms;
 2. Requests the parties in dispute to put an end to the hostilities and to seek a negotiated solution to the Kurdish problem taking into account the respect of human rights;
 3. Calls on the Council and the Member States of the European Community to take immediate steps to suspend all arms shipments to Iraq as well as all exports of chemical substances or equipment which could be used to produce chemical weapons;
 4. Calls on the Member States of the Community, acting in cooperation with the Government of Turkey and humanitarian organizations, to provide all possible assistance to the Kurdish refugees;
 5. Instructs its President to forward this resolution to the President of the Foreign Ministers meeting in political cooperation, the President of the Commission, the Heads of State and Government of the Member States and the Iraqi authorities.

Rêzimana Kurdî

(Zaravê Kurmanci)

- XV -

Mir Celadet Bedir Xan û Roger Lescot (*)

V. Tewandin [2]

Tewandina nav di rewşa ne binavkiri de

120. Tewandina gotinên ku bi dengdêrekê diqedin.

Paşdanîna pêşkerên awayî di gotinên ku tîpa wan a dawîn dengdêrek e, diyarbûneyên (hadiseyên tebîî) ku ji pîr nêzik de ewên ku me ji berê li ser parekan lêhûrnêrî bûn (li pişk "fesl" IV binêre) tînin bira me derdixîne. Divê ku em pêşan bidin ku, di vê rewşê de jî, teşeyên (awa, şikl) hevgirtî bi awakî giştî ji teşeyên biservehatî (munta-zam) çêtir tînin girtin (tînin tercîh kirin), her gava ku bikaranîna wan mumkun be.

Nîşank I. Tu awayekî hevgirtî nayê pejirandin (qebûl kirin), dema ku rengdêreke

(sifet) pêşker, nebinavkiri, pîrskerî yan jîmarin were pêşîya gotin (li bend 115, perçeya siyemîn binêre).

Nîşank II. Di vajayê (ekş) rewşa tebîî de, di rewşên weha de, paşdanîna pêşkera -o ya awayê bangî yê nêr bo gotinên ku bi dengdêrekê diqedin bi awakî giştî nabe sedema xuyabûna dengdêreke girêdanê yan diyarbûneyeke hevgirtinê. Rasthatîna du dengdêran, ku encama (netîce) ragihandîna vê -o'yê bi gotinên bi a, e, ê, o ye, weka tebîî hatiye pejirandin. Ango ev y ji piştî û, di navçeyên ku tê de ev deng ü (wi) tê bi lêv kirin de, gelek pêwîst e (li bend 20 binêre).

Ji alîkî din, û ev îstîsnayekê din a rêzîkên (qaide) giştî yê girêdanên ahengî ye, pêşkera -ino ya awayê bangî yê gelejmar yê her du zayendan (cîns) xwe dispêre n, ne ye yan w, dema ku ew xwe radigihîne gotineke ku bi dengdêrekê diqede.

121. Gotinên bi -a û -e.

Di awayê tîrkerî yê her du jîmaran de, dengdara girêdanê y ye; teşeyên hevgirtî -ê, ji bo gelejmar, didin û -an ji bo her du zayendan. Di awayê bangî de, hevgirtin bitenê ji bo gelejmar tê pejirandin. -

(*) Grammaire kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin: Pervin.

1) Gotinên bi -a

	Nêr Nişe : zava		Mê Nişe : çira	
	Teşeya biserve- hati	Hevgirtin	Teşeya biserve- hati	Hevgirtin
Têrkera yekejmar Bangê yekejmar	zavayî zavao	zavê	çrayê çirayê	çirê çirê
Têrkera gelejmar Bangê gelejmar	zavayan zavanino	zavan zavano	çirayan çiranino	çiran çirano

2) Gotinên bi -e

	Nêr Nişe : pale		Mê Nişe : perde	
	Teşeya biserve- hati	Hevgirtin	Teşeya biserve- hati	Hevgirtin
Têrkera yekejmar Bangê gelejmar	paleyî paleo	palê	perdeyê perdeyê	perdê perdê
Têrkera gelejmar Bangê gelejmar	paleyan palenino	palan paleno	perdeyan perdenino	perdan perdeno

Nişank I. Dema ku hin serenavên bi e, weka Franse, Sûriye, Tirkiye, awayê têrkera wan biservehati be, e'ya wan a dawin bi rasthatina y'ya girêdanê bi a dirêj dibe. Bi vî awayî : Fransayê, Sûriyayê, Tirkiyayê. Teşeyên hevgirtî : Fransê, Sûriyê, Tirkiyê ji tên pejirandin. -

Nişank II. Avabûna ku bi hevgirtina awayê têrkerî yê yekejmar yê navên nêr ku bi -e yan -a diqedin dibe, bi rasti bitenê rewseke taybetî (xusûsi) ya rêzika benda 114 ye.

122. Gotinên bi -ê.

Dengdara girêdanê y ye;

e'ya dawin bi e tê guhertin. Di awayê têrkerî de, hevgirtin bitenê di yekejmarê de tê pejirandin; ew -ê, ji bo her du zayendan dide, û bi vî awayî teşeya gotinê neguhertî dihêle. Di awayê bangî de, teşeyeke hevgirtî di gelejmarê de tê pejirandin.

	Nêr Nişe : malxwê		Mê Nişe : dê	
	Teşeya biserve- hati	Hevgirtin	Teşeya leiserve- hati	Hevgirtin
Têrkera yekejmar Bangê yekejmar	malxweyi malxwiyi malxwêo	malxwê	deyê diyê deyê diyê	dê
Têrkera gelejmar Bangê gelejmar	malxweyan malxwiyan malxwênino	malxwêno	deyan diyan dênino	dêno

123. Gotinên bi -î.

Dengdara girêdanê hergav

y ye; îya dawîn bi î tê guhertin. Hevgirtin bitenê di awayê têkerî yê nêrê yeke-

jmar (ew teşeya gotinê neguherti dihêle) û awayê bangî de mumkun e.-

	Nêr Nişe : rêwi		Mê Nişe : kebanî	
	Teşeya biserve-hatî	Hevgirtin	Teşeya biserve-hatî	Hevgirtin
Têrkera yekejmar Bangê yekejmar	rêwiyî rêwiya	rêwi	kebaniyê kebaniyê	
Têrkera gelejmar Bangê gelejmar	rêwiyân rêwinino	rêwino	kebanîyan kebanînino	kebanîno

124. Gotinên bi -û û -o.

Di awayê têkerî de, dengdara girêdanê bi awakî giştî w ye (di hin peyvikan de y ye. Li bend 19-20 binêre); li ber w, ûya dawîn

bi î tê guhertin; o tu guhertin nabîne. Bikaranîna y, weka dengdareke girêdanê, dengdêra dawîn û yan o neguherti dihêle. Di peyvîkên Rojhilatê de, y'êke girêdanê di awayê bangî yê

gotinên nêr ên bi -û de xuya dibe. Di awayê bangî yê gelejmar de, bitenê hevgirtinên gotinên bi -û û -o, û di awayê bangî yê yekejmar û gotinên nêr ên bi -o de tèn pejirandin.

1) Gotinên bi -û.

	Nêr Nişe : rû		Mê Nişe : xwesû	
	Teşeya biserve-hatî	Hevgirtin	Teşeya biserve-hatî	Hevgirtin
Têrkera yekejmar Bangê yekejmar	rîwî rûyî rûo rûyo		xwesiwê xwesûyê xwesiwê xwesûyê	
Terkera gelejmar Bangê gelejmar	rîwan rûyan rûnino	rûno	xwesiwan xwesûyan xwesûnino	xwesûno

2) Gotinên bi -o.

	Nêr Nişe : zaro		Mê Nişe : co	
	Teşeyên biserve-hatî	Hevgirtin	Teşeyên biserve-hatî	Hevgirtin
Têrkera yekejmar Bangê yekejmar	zarowî zaroyî zaroo	zaro	cowê coyê cowê coyê	
Têrkera gelejmar Bangê gelejmar	zarowan zaroyan zaronino	zaronno	cowan coyan conino	conno

125. Gotinên ku kîteya wan a dawîn -î distîne.

Diyarbûneyên ku ragihan-

dina pêskerên awayî bo van gotinan ava dikin eynî yên ku li ser parekan, li jor, hatin nişan dan in (bend 109).-

Pêsgotî : Bav harsim (tiryê ne gihayî) dixwê, dranên kur dişikihîn.-

VI. Tewandin

Tewandina nav di rewşa nebinavkiri de

126. Awayê kirdeyî

Nav bitenê parekê distîne, bê ku tu pêskereke din bistîne.

a) Nêrê yekejmar

Mirovek (mirov)
Hespek (hesp)

b) Mêya yekejmar

Dotmamek (dotmam)
Mehinek (mehin)

c) Gelejmarê her du zayendan

Mirovin
Hespin
Dotmamin
Mehinin

127. Awayê têrkerî

Pêskerên ku xwe radigihînin pareka gotina ku paşda-nikiri bûye ew in ku ewê bi awakî gîstî xwe bigihînin navê binavkiri.

a) Nêrê yekejmar : -î

Ez mirovekî dibinim.
Ez hespekî dikirim.

b) Mêya yekejmar : -ê

Ez dotmamekê dibinim.
Ez mehinekê dikirim.

c) Gelejmarê her du zayendan : -a

Ez mirovîna (hespîna, jî-nîna, mehinîna) dibinim.

Nîşank I. Pêskera -a ya têrkera gelejmar pêskera tebiî -an ku n'ya wê ne ketiye bixwe ye.

Nîşank II. Navên ku di rewşa mutlaq de ne nikarin bikevin awayê bangî.

Nîşank III. Di peyvika Hevêrkan (Tor Abdîn) de, teseyeke gelek taybetî (xusûsi) ya awayê têrkerî yê gelejmar, a navên nebinavkiri, hat ditin. Ew encama (netîce) ragihandina pêskereke -î bo pareka navê nêr û -ê bo ya navê mê ye. Ew weka awayê gîstî, lê di rêzayê (mana) perçeyî de, tê bi kar anîn.

Nîşe :

Avînê bide min (hinek av bide min).

Gostinî bide min (hinek

gost bide min).

Di peyvikên din de tê gotin :

Nîşe :

Avê (yan av) bide min.

Gostî (yan gost) bide min.

Nîşank IV. Di peyvikên ku pareka nebinavkirinê -in (li bend 110 binêre) bi kar naynin de, dawîneya -ina ya awayê têrkerî yê gelejmar bi avahiyên jêrin tê guhertin :

Ez hinek hespan dibinim : ez hespîna dibinim.

Yek caran ez diçim nêçirê : ez carîna diçim nêçirê.

Ev bikaranîna taybetî ya **yek** di gelejmarê de bitenê jî bo awayê têrkerî tê peji-randin. Tucar nayê gotin : yek hesp yan yek car dêlva hespin û carin.

128. Hebûna pêskereke awayî dikare bibe sedema ketina dengdêra pareka nebinavkirinê. Wê gavê, em van teseyan dibinim :

Hespkî, dêlva hespekî.

Mehinkê, dêlva mehinekê.

Mirovna, dêlva mirovîna.

Lê ev girêdan ne her gav mumkun e. Bi vî awayî, di rewşa **mehîn** de, meriv nikare bêje mehin'na, dêlva mehinina. Bi rasti, teşeya hevgerî mehin'na ewê bi neçarî (icbarî) mehina bide, ji bo ku di kurdî de dûbarebûn (tekrar) nayê pejirandin (li bend 64 binêre); êdî ne mumkun e ku meriv awayê têrkerî yê gotina di rewşa nebinavkirî de ji awayê wê ya têrkerî ya di rewşa binavkirî de cihê bike (mehina

dêlva mehinan). Ji bo sedemên weha jî, awayê têrkerî yê yekejmar yê **çêlek, mirîşk, û hwd.** ewê her gav di rewşa nebinavkirî de bibê **çêlekekê, mirîşkekê, û hwd., û tucar nabe çêlekê yan mirîşkê, û hwd.**

129. Tewandina gotinên bi **-a, -e, û hwd.,** di rewşa nebinavkirî de, tu taybetiyeke dariçav xuya nade. Bi rasti, têr dike ku meriv pêşkerên awayî yên pêwist

ragihîne van gotinên ku parêka wan a nebinavkirinê ji berê de heye (li bend 103 û yên paştir binêre).

Nîşe :

Paleyekî (yan palakî, palêkî, palekî), awayê têrkerî yê yekejmar (ji pale).

Cowekê (yan coyekê, cokê), awayê têrkerî yê yekejmar (ji co).-

I 30. Nexşeya biraninê.

	Nêr	Mê
Kirdeya yekejmar	Mirovek Hespek	Dotmamek Mehinek
Têrkera yekejmar	Mirovekî Hespekî	Dotmamekê Mehinekê
Kirdeya gelejmar	Mirovin Hespin	Dotmamin Mehinin
Têrkera gelejmar	Mirovina Hespina	Dotmamina Mehinina


Pêşgotî : Malê dinê qloçê mêran e.



Dûmahî heye

Sêwiyên cihanê

J. P. Zanders



Pêsgotina Têkoser

Têkoser biryar da ku isal û di sala wêbê de filmeke vidêo ya belgeyî (dokumentêr) ya gelek hêja, ku li ser nijadkujiya Halabca hatiye çêkirin, li hemî bajarên Beljîka bide nişan dan. Di şeva ku me li Brukselê pêk ani de, hevalê me yê beljîkî, Jean-Pascal Zanders, ku pirtûkekê li ser çekên şimik dinivise, vê axaftina jêrîn kir. Em wê li vê derê werdigerînin kurdî :

Sêwiyên cihanê

Ji sala 1983 heta nuha kaniyên serbixwe dibêjin ku Iraq bi awakî rêkûpêk (mun-tazam) çekên şimik bi kar tîne. Rapporên cihê yên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (O.N.U.) bikaranîna gazên xerdel, neurotoxique û cyanide hydrogène dilniya (tekid) kir. Lê isal encama

(netice) van rapporan mah-kûmkirina vekirî ya Iraqê ji aliyê O.N.U. bû. Ji wê gavê, ev dewlet li çend eniyan gihajt serfiraziyên ku ne dihatin biran. Pîstî agirbirina 20'ê Tebaxê, wê hêzên xwe yên leşkerî li Bakur civandin, ji bo êrişeke giştî li ser Kurdistanê. Van hêzan heta iro ji 100.000 kes bêtir ber bi Tirkîye û Iranê qewirandin.

Erişên şimik

Serrê şimik bitenê aliyek ji yên nijadkujiya Kurdên Iraqê ye. Di eynî demê de, gundine seranser hatine tiraş kirin, malbat ber bi çolên hişk ên Iraqa navendî hatine sirgûn kirin. Kirinên weha ji aliyê rêxistinên kurdî berê deh salan hatin êskere kirin, lê mixabin, bê tu encam.

Kurd bawer in ku ev

êrişeke diji wan e. Nişe : Di 13 Gulan 1987 de, serhildanek li Halabca, diji destelatan (Iqtidar, otorite) iraqî ku leşker bilez sand wê derê, çêbû. Li gora şahadeta Ali S., pêsmergeyek di tabûra çaremin de, li navçeya Silêmaniyê, ku em di Ilona 87 de rasti wî hatin, pelixandin ewqas xurt bû ku birindar ji nexweşxanan dihatin derxistin ji bo ku sax bîn gor kirin. Beşeke giring ji gelheyê re-viya Iranê yan ji xwe gihand rêzên berxwedanê. Şahadeta Ali S. piştê gelek di cih de hat. Bombabarana trajîk a Halabca bi çekên şimik, di Adara buhuri de, xuya ye ku sezadana (cezakirin) dawîn a gelheya ku wêra bû ku pêşwaziya (istiqbal) pêsmergeyên kurd û serbazên (esker) irani, weka azadker, bike û bi vi awayî, careke din, di navbera salekê de, nefreta xwe, li gel êrişa cezadanê ya buhuri, ji bo Saddam Husseyn nişan bide.

Erişên bi çekên şimik diji gundên kurdi bê gûman pişti Adara 1987 gelek caran bûn; lê ew tucar ne gihajtin firehbûna yên Halabca.

Serrê Xelîcê

Di rewşên nuh ên bikaranîna çekên şimik de, meriv tişteki herdemî dibîne: Ev çek, gava ku dijmin gengaziyên (wasite) wî yên xwe-paraztinê yên ferdî yan kollektîf yan jî yên bersivdayînê tu nebin, tînan bi kar anîn. Ev nişan dide çima jî serrê cihanê yê yekemîn çekên şimik bitenê li Cihana Siyemîn hatin bi kar anîn. Eger meriv bi ittihamên iraqî bawer bike, leşkerê îranî jî çend caran van çekan bi kar anîn, lê her gav bi awakî tenha. Meriv dikare texmîn bike ku Iran tecrubeyên xwe çêdikir û dibe ku jî sedema encamên wan ên ne baş, wê giraniya xwe da xurtbûna xwe ya moral, yan jî ji bo ku ew jî bombebaranên şimik ên bi rokêtan li ser navendên mezin, ku diji wan wê nikariba tutiştî bikira, ditirsiya. Ev kêmasî bê gûman gelek giring bû. Bi rasti, maskên wê yên gazê û cillên xweparaztinê diji gaza xerdel yan yên neurotoxiques kêr bûn. Lê ew hebin jî, nîrxê (qîmet) van destgehan ne dibû, ji bo ku di 40° bêtir de, meriv nikare ji 15 xulekan (daqe) bêtir wan bikîşîne, bê ku jî germayiyê bimire.

Xweparaztina tibbî

Ji bo ku Kurd tucar bi çekên şimik xerik (mijûl) ne bûn, ew hin jî qelstir bûn. Di navbera Adar û Gulan 1987

de, gelek gundên navçeya Silêmaniyê bombebaranên iraqî bi çekên şimik kişandin. Ev hinbûneke xemgin, hem jî bo sivilan û hem jî bo pêşmergeyan, bû. Ali S. jî merê got ku ev tecrubeyên trajîk jî xelk re hin kir ku nêzîkbûna agir, av yan berf merivan, bi awakî rêjeyî (nisbî) be jî, diji van çekan diparêze. Ji wê gavê, ew xwe diji êrişên gazan bi awakî basit xwe diparêzin: Xwe nêzîkî agirekî dikin û potên şil li ser dev û pozê xwe diguvêşin. Ji derveyî çend maskên gazê, ku jî leşkerê iraqî hatine stendin, ev awayê paraztinê yê ku bêtirin tê bi kar anîn e. Lê diji neurotoxiques û gazên xerdel, ku jî cillan derbas dibin û êrişî çermê dikin, potên şil û heta maskên gazê jî bitenê hinek riyên nefesê diparêzin. Li cihên ku gelek xweydan derdixinin, gaza xerdel li ba Kurdan sewatên gelek giran çêdike.

Saxkirinên birinan hema tu nene. Di navçeyên tenha de, bijîjk (doktor) nayên ditin. Agahdari û tecrube jî devan digihêjin guhan; hin caran Kurd li ser vê yekê fêran pêk tinin. "Lê meriv jî bo zaroke-

ki ku bi awakî ecêb dikuxe çî bike?", dipirse Ali S. bi dengekî xemgin. "Gava ku meriv ne bijîjk be, çawa alî wî bike? Gava ku çavên zarok sor bin, jî derveyî şustina wan bi ava zelal, meriv çî bike? Cîqas kes hene ku heta vê kirina basit jî nizanin ...?". Ji berê, çara tenê ew bû ku nexweşan bibin nexweşxaneyên îranê. Lê vê jî pirsên mezin derxistin. Mesafeta ku bi firina çivik jî sed kilometreyan ne dûrtir e, jî sedema çiyayên kaş û şiveriyên ku pir caran bi bombe ne pênc caran dirêjtir dibe. Gelek birindar di rê de dimirin, jî sedema iltihabên birinên ku bixwe ne bitehlîke ne.

Erişa vê havinê rewşeke bicarek cihê derxist. Leşkerên hikûmetê Kurdan ber bi Tirkiye û îranê, ev welatên ku ew jî jî aliyê paraztina mafên mirovî ne bê gûman in, diqewirinin. Inkarkirina Tirkiyê ku jî nav penaberan birindarên gazan hene nahêle ku civaka navnetewî bilez mutexessîsan û dermanên pêwîst bişîne.

Li îranê jî Kurd zordestiyê dikîşinin, li gel ku di 1979

de ew bi awakî geş beşdar bûn xistina rejîma Sah.

Eger em werin Kurdên Tirkîyê, kovara Newsweek ji kirinên leşkerê tirkî dijî serhilên kurd re dibêje "search and destroy" (bigere û imha bike!), û bi vi awayî pratikên amerîkî li Vietnamê tine bira me.

Pelixandina sistematîk a civakeke ku ji 20 milyonan bêtir e vê pirsê derdixîne: Cima civaka navnetewî di dengdanê de dereng dimine? Bersiva tenê heta berê demeke kurt bêdengiyêke xurt bû. Serokê kurd ê efsanî, Mustafa Berzani, di 1979 de, li ser textê mirinê, çar salan piştî şikestina serhil-dana kurdî dijî Bexdayê, digot: "Em sêwiyên cihanê ne. Bi rastî, tukes li cihanê bi tîştê ku tê serê me mijûl nabe". Bi rastî, nefreta ku di nêzik de hat nîşan dan ji bo awayê ku Kurdên Iraqê pê hatin êrîş kirin, ne ji bo bûyerê bixwe, çêbû.

Serrê şimik û rêaksiyonên navnetewî

Rêzikên (qaide) nuh ên huqûqa navnetewî bitenê gava ku dijî menfeetên netewî yan ên çend welatan dernakevin tîr ferz kirin. Ev tîşt di bikaranîna çekên şimik di serrê Xelîcê de hat îsbat kirin. Nuha, ku Iran û Iraq agirbirinê imza kir, cihan ji nîşka ve dibîne ku Protokola Cenevê bi awakî giran hat pelixandin. Di navbera 1984 û 1988 de, mutexessîsên serbixwe ji Konseya Emnîyetê re pênc raporên giran li ser Iraqê pêşkeş kirin, lê diviya ku ew li benda vê havinê bimînin



ku navê Iraqê di biryara O.N.U. de bê nivîsin.

Li gel ditineke saf ku iro belav bûye, Protokola Cenevê di 1925 de serfiraziyêke pîrr piçûk ji îdêala bêçekkirinê bû. Ew bêtir çareke nivçe li hemberî parazerên çekên şimik di nav Civaka Netewî de bû. Kêmasiyên Protokolê ku piraniya caran tîr teshîr kirin ev in:

- Ew bitenê ji bo dewletên imzaker tezyîqek e.
- Gava ku dewleteke imzaker bi çekên şimik ji aliyê dewleteke din a imzaker yan yek ji hevalbendên wê tê êrîş kirin, tatbîqkirina protokolê tê rawestandî "no first use".
- Ne çêkirin û ne embarkirina van çekan qedexe ye.
- Di dawiyê de, tu seza (ceza) ji sûckeran re ne hatiye dayin.

Di dema serrê Xelîcê de, valayiyêke nuh a huqûqî di rewşeke ku gotûbêjkerên 1925 bê gûman nikari bûn bixin xeyala xwe, heta di kabûsên xwe yê kirêttirin de, angû ku rojêke dewletek

ewê dijî besêke ji gelheya xwe van çekan bi kar bîne, çêbû.

Eger cihan karî bû çavên xwe li ser bikaranîna çekên şimik ji aliyê Iraqê bigire, bitenê ji tîrsa ku şoreşa îslamî fireh bibe û bigihêje derveyî sinoran e. Rojava ji tehlika ciddî ya birîna petrolê ditirsiya û Yekîtiya Sovyetî û gelek welatên Cihana Siyemî ji hejana îstîqarê hundirî gelek ditirsiyan. Prestîja Neteweyên Yekbûyî gelek kêr bû, berê jî sedema nahezîya herdemî ya Rojhilat û Rojavayê di navbera endamên Konseya Emnîyetê de; piştî jî sedema redkirina biryarên Dadgeha Navnetewî yê li ser Nikaragûa ji aliyê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê; û di dawiyê de, jî sedema rawestandîna para amerîkî. Bi van astengên xwe, vê rêxistina navnetewî nikari bû Protokola Cenevê bê nezelalî tatbîq bike.

Neteweyên Yekbûyî bê çare ne

Dema ku di dawiya 1983 de bijîjkên îngilîz Iraqê bi awakî giran mahkûm dikir,

civina giştî ya O.N.U., di biryara xwe 37/98D de, izin dida Sekreterê Giştî ku piştî şikayeteke fermî (resmî) bikaranîna çekên şimik ji aliyê mutexessîsên serbixwe bide dîtin. Lê diviya ku Perez de Cuellar, bi saya mîrxasiya xwe ya sexsî, ne li gora biryara 37/98D, lê ji bo "sedemên acil ên mirovî", heyeteke mutexessîsan bişîne Iranê, li gel dijîtiya hêzên mezin. Wê gavê Yekîtiya Sovyetî ji nuh de çekan dida Iraqê û Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê pêwendiyên xwe bi vî welatî re ji nuh de girêdidan.

Ji bo ku Iraq, li gel gelek rapporên mutexessîsan, tucar ji bo têkdana (xerakirin) rêzîkên huqûqa navnetewî bi awakî vekirî ne hat mahkûm kirin, serokên Bexdayê bêtir bawer dikir ku wan kari bû, bê seza, şerr bi vî awayî dewam bikin. Lê gava ku 4000 kes li Halabca, di Adara buhurî de, hatin kuştin, xuya ye ku Saddam Husseyin sinora ku ji aliyê civaka navnetewî hati bû pejirandin (qebûl kirin) zêde derbas kir. Mahkûmkirina fermî ya Iraqê di dawîya Hezîranê de xebateke hevrayî ya Konseya Emniyetê da dest pê kirin; û vê yekê hişt ku sekreterê giştî, di demeke gelek kurt de, ango di 20'ê Tebaxê de, agirbirinê ji şerkeran re bide pejirandin.

Lê, di navbera Halabca û mahkûmkirinê de şerr ket avantaja Iraqê ku çekên şimik diji Iranê, û piştî agirbirinê diji Kurdan, bi kar dianîn. Di vê demê bixwe de, protêstoyên navnetewî ewqas fireh bûn ku ji bo êrişên nuh, ku bi deh hezaran Kurd qewirandin Tirkîye

û Iranê, cihan ji nişka ve nema isbatên xurt xwestin û ku tavil sezayên aborî hatin dayin. Sedema vê guhertina mezin vekirî ye : Iran nema tehdîdekê teşkil dike û, di vajayê vê de, Iraq dibê hêzeke navçeyî.


Encamên şerrê çekên şimik li Xelîcê

Destelata (otorîte) moral a Protokola Cenevê tucar ji 50 salan bi awakî ciddî kêmtir ne bûye, li gel dîroka wê ya kevnar a nezêlal. Gelo divê ku em bawer bikin ku rewşa nuh a navnetewî izin dide ku her kes karibe, ji bo sedemên xweparaztî, bê tehlika sezayê, çekên şimik bi kar bîne ? Dîtîneke weha şerîkirina çêkirin û embarkîrîna wan dixwaze û dikare bibe gaweke giring ber bi klassîkkirina vî celebê çek. Bi rastî, bikaranîna wan dikare di her rewşeke taktîk de bê bir kirin. Bi ser de jî, meriv ji xwe dipirse gelo welatek dikare bi serbestî van çekan diji gelheya xwe bixwe bi kar bîne ? Ji bo ku tu biryar vê rewşê nabîne û ku O.N.U. nikare têkilî "şerrên hundirî" bibe. Bi gotinên din, Iraq hem teşe (awa) û hem jî naveroka Protokola Cenevê nerehet kir.

Nuha, herkes firehbûna bela dibîne, nemaze ku birên (fîkr) li ser lihevhatîneke cihanî ya bêçekkîrinê li O.N.U., li Cenevê, di vê salê de pêssîmîst bûne. Careke din, xuya ye ku stendîna biryareke tevane ji aliyê civaka navnetewî ne mumkun e. Ji nuh de menfeetên din ên pêwîsttir di ufuqê de xuya dibin. Gelek welatên rojavayî - nemaze Fransa ku

dergevana Protokola Cenevê ye û ku divê di rewşeke têkdanê de mudahale bike - karên aborî yê zêrîn di nuhavakirina Iraqê de bir dikin. Tirkîye jî hebûna birindarên "gazkirî" di nav penaberên kurd de inkar dike, ji bo ku ew ji Iraqê 45% ji petrolê distîne û ku pê re pêwendiyên wê yê bazarganî yê gelek giring hene. Welatên ereb piştgiriya Iraqê ya bê sinor dikin û di ittihaman de komployeke siyonîst dibînin.

Hin welatên Cihana Siyemîn, ku bi awakî taybetî bala xwe didin çekên şimik, ji sedema serfiraziya Iraqê, bê gûman gihajtîne bawerîya ku feyda cinayetê heye. Meriv nikare bû Hiroşîma kurdî yan iranî texeyyul bikirin, eger di 1982 de sentrala atomîk ku Saddam Husseyin dest pê kiri bû ava bike bi bombeyên îsrailî ne hatiba kirin.



Dîroka Kurdistanê di

- XV -

VI- Zargotin û bêje

A- Zargotin (folklor)

Weka li ba hemî gelên ku fêrbûna wan ya dibistanî hin kêr pês ve çûye, bêjeya (edebiyat) devkî ya kurdi ava ye û gelek dewlemend e. Prof. O. Vilçevski behsa şînbûna zargotina wê kir. Loma, gelek belge ji aliyê rojhilatzanên biyani hatin berhev kirin û weşandin: A. Jaba, Recueil de notices et récits kourdes, Saint Petersburg 1860; E. Prym, A. Socin, Kurdische Sammlungen, 1890; O. Mann, Kurdische u. Persische Forschungen, IV, Die Mundart der Mukri, Berlin, I, 1906, II, 1909; H. Makas, Kurdische Texte, (Mardin), Leningard 1926; B. Nikitine, Kurdish stories from my collection, di BSOS, IV (1926), 121-38 de; nivîskar bixwe, Quelques fables kurdes d'animaux, di Folklore, XL (1929), 228-44 de; R. Lescot, Textes kurdes, I, Paris 1940, II, Beyrût 1942; Th. Bois, L'ame des Kurdes à la lumière de leur folklore, di Cahiers de l'Est, Beyrût, N° 5 û 6 (1946) de; S. Wikander, Recueil de textes kurmandji, Uppsala-Wiesbaden 1959; D. N. Mac-

Kenzie, Kurdish dialect studies, London 1961-2, cildê 2min.

Kurd bixwe, ji destpêka serrê cihanê yê yekemin, bir kir ku serwetên zagotini ji pîran yan ji çirokbêj û dengbêjên hoste ku her gav kêr dibin berhev bikin. Berê, mirên Bedir Xan, ji 1932 heta 1946, di kovarên xwe, Hawar, Ronahi û Roja nû de; H. Cindi, E. Eydal, Folkloro kurmanca, Erivan 1936; H. Cindi, Folkloro kormanciê, Erivan 1957. Kovareke giştî di I. M. Resûl, Edebi Folklori kurdi de. Lêkolînewe, Bexda 1970 (li Th. Bois, Connaissance des Kurdes, 117-25 binêre).

Ev dewlemendiya zargotini

berê di pêsgotiyên, metelokên geleri, têxistinî de tê ditin. Kurd hez dike ku pywa xwe bi pêsgotiyên bi wezn û qafiye ku hesteye (hiss) rast a baldanê nişan didin bixemilîne. Pêsgotî kurteyeye xweş a aqilmendiyeke pratik nişan didin. Bi vî awayî bi hezaran pêsgotî hatin weşandin. E. Noel, The character of the Kurds as illustrated by their proverbs and popular sayings, di BSOS, IV (1921), 79-80 de; D.P. Margueritte û Mir K. A. Bedir Xan, Proverbes kurdes, Paris 1938; R. Lescot, Proverbes et énigmes Kurdes, di REI, IV (1937), 307-50, pasê ev metn ji nuh de di Textes kurdes, I, 189-237 de hat weşandin û bêtir kirin, Prampolini, Proverbi



(*) Encyclopédie de l'Islam, 1981. Wergerandin; fransîzi-kurdi : Pervin-

Ansîklopêdiya Islamê de (1)

kurdi, Milano 1963; D. N. MacKenzie, Same kur-dish proverbs, di Iran, JBIPS, VIII (1970), 105-13 de; Is-mail Heqî Saweys, oise-i pêşinan, Bexda 1933; Marûf Ciyawok, Hezar bêj û pend, Bexda 1930; Cegerxwin, Gotina pêşina, Sam 1957; M. Xal, Pend-i pêşinan, Bexda 1957; Cemil Kenna, Amsal kurdiyya, Heleb 1957; O. Celil, Mesela û metelokên cimaeta Kurda, Erivan 1969-71, 2 cild; O. Celil, Kurdskie posloviei i pogovorki, Moskov 1972; J. Nebez, Sprichwoerter und Redensarten aus Kurdistan, Munich 1970. Pêsgotiyên ku di Cindi, Folklor, 1957, 249-81 de, di rêzimanên Jardine û Beidar de û di ferhenga Merdûx, II, 1-86 de hatine nivîsin pîrr in.

Jimara stranan, ji aliyê pîrbûn û cihêtiyê, bê dawî ye: stranên dilanê (dîlok), ên evînê (lawik) yan ên şer (şer yan delal), stranên kurt ên guhertina dema beharê (serêle) yan a payizê (pahî-zok), stranên dê ji zarokê xwe re (lorî), ên zewacê (hevalê yan serêzavano), stranên şinê (matem) ji (şin yan qewil) Jîna rojî ya Kur-dan ji dergûşê heta gorê û di dirêjayiya rojên wan ên xe-bata dijwar de nîşan dikin. Kovarên Hawar, Ronahî û Roja nû ji wan sedan wesandî; bi vî awayî ji H. Cindi, E. Evdal, Folklor, 342-474; H. Cindi, Folklor a kor-manciê, 189-248; û herwe-



ha P. Rondot, trois chansons kurdes, di cah. du Sud, 274 (1945), 817-24 de; B. Nikitine, La poésie lyrique kurde, di Ethnographie, XLV (1945-50), 39-53 de M. Makri, Gûrani ya taran-ha-ye kordî, Tehran 1951; G. Chalianf, Poésie populaire des Turcs et des Kurdes, Paris 1961; H. Cindi, Kila-mêd cimaeta Kordaye Li-rikiê, Erivan 1972. Ji derveyî vana, li berhevokên bi notên muzîki ku li jor hatine nîşan dan binêre.

Çirok û kurteçirokên bi Pêşe (ne helbest) bê jimar in û tije xeyal in. Efsane dihêlin ku meriv derdên jinê ji bir bike, çirokên kenokî tije henek in, kenokiyên henekê di rexnekirina kêmasiyên merivan, ên êlên nahez, se-rokên, olî, weka di fablên

(çirokên lawiran) ewropî yê çaxa navin de herêna (tered-dud) nakin. Kurd nemaze pîrr ji çirokên lawiran ku hergav ji wan fêreke moral derdi-keve hez dikin. M. Dufresne, di Un conte kurde de la région de So'ort, di JA, 1910, 107-17 de; B. Nikitine û Soane, The tale of Suto and Tato, di BOS, III (1923), 69-106 de; B. Nikitine, Kurdish stories, berhem gbnbixwe, 1926, 121-38; R. Lescot, Textes, I, 2-185; H. Cindi, E. Evdal, Folklor, 1936, 579-651; H. Cindi, Folklor, 1957, 161-88; M. Xaznadar, Aleman kurdi and other Kurdish short stories, Bexda 1969; A. Brunel, Gulusar. Contes et légendes du Kurdistan, Paris 1946; Joyce Blau, Trois textes de folklore kurde, di

Etudes, Bruxelles, VII (1965), 29-50 de; J. Nebez, *Kurdische Maerchen und Volkserzaehlungen*, NUKSE, 1972.

Li ba van celebên piçûk, gelek efsanên pîrê dirêjtir perçeyên bijarte yê zargotîna kurdi ava dikin. Meriv dikare wan di celebên cihê, ku piricar digihêjin hevdu, de rêz bike. Hin efsanê bîngeha wan sihirbazî ye, weka Memê Alan (Lescot, *Textes*, II, 2-369) yan Sêva Hacê yan Hoznek; hin jî wan teşeya (awa, şikl) wan bitenê evîni ye, weka Zelîxa û Fatûl, Leyla û Mecnûn, Siyabend û Xecê, Zembillîfiroş, Xursîd û Xawer, Şîrîn û Xoşrew, Şîrîn û Ferhad, Faxîr û Sîtiyê, Manîca û Bijan; di dawiyê de helbestên qehremaniyê (êpopée) yê bi naveroke dirokî, weka Dimdim, Julîndî, macerayên Rustem bi Zoraw re, Cîhangîr yan Zendeheşeng û di demeke nuhtir de Nadîr û Topal, Dozdeh Siwarên Merîwan ya Abdul Rehman Baban yan Ezdînsêr Bedîr Xan. Van çîrokan navê dengbêjên hoste ku celeba wan dike hunda bibe bilînd dikir. Meriv dikare hemî van metnan di berhevokên Mann, Prym, Socîn, Cîndî û hwd. de bixwîne, û di Th. Bois, *Poètes et troubadours au pays des Soviets*, di *Machriq*, LIII (1959), 266-99 de; nivîskarên cihê, *Kurdiskie epîtçeskie pesni skazi*, metn û wergerandin Moskov 1962; V. Minorsky, *The Gûran*, 1943, 75-103; O. C. Calilov, *Kurdskij geroiçeskij epos "zlatorukij Khan"*, Moskov 1967; O. F. Qazî, *Mehr-o-Vafa*, Tebrîz 1966; A. Ayyubian, *Cirike kurde*, Tebrîz 1961; nivîskar bixwe,


Cirik Xec û Siyabend, Tebrîz 1956; Pîremêrd, *Diwanze siwarê Merîwan*, Silêmanî siwarê Merîwan, Silêmanî 1953; Gêw Mukriyani, *Zembillîfiroş*, Hewlêr 1967; M. Mokri, *La légende de Bizan û Manîfa*, Paris 1966; nivîskar bixwe, *Le chasseur de Dieu et le mythe du Roi-Aigle*, Wiesbaden 1967; K. A. Bedîr Xan, A. de Falgairolle, *Le Roi du Kurdistan*, Roman épique kurde, Gap; K. A. Bedîr Xan, Herbert Oertel, *Der Adler von Kurdistan*, Postdam 1937, *Cegerxwin*, *Serpêhatiya Rewisê Dari*, Şam 1956; J. Blau, *le Kurde de 'Amadiya et du Djabal Sindjar*, Thèse de doctorat du 3e cycle, Paris 1973.

Abdul Rehman Baban yan Ezdînsêr Bedîr Xan. Van çîrokan navê dengbêjên hoste ku celeba wan dike hunda bibe bilînd dikir. Meriv dikare hemî van metnan di berhevokên Mann, Prym, Socîn, Cîndî û hwd. de bixwîne, û di Th. Bois, *Poètes et troubadours au pays des Soviets*, di *Machriq*, LIII (1959), 226-99 de; nivîskarên cihê, *Kurdiskie epîtçeskie pesni skazi*, metn

û wergerandin Moskov 1962; V. Minorsky, *The Gûran*, 1943, 75-103; O. C. Calilov, *Kurdskij geroiçeskij epos "zlatorukij Khan"*, Moskov 1967; O. F. Qazî, *Mehr-o-Vafa*, Tebrîz 1966; A. Ayyubian, *Cirike kurde*, Tebrîz 1961; nivîskar bixwe, *Cirik Xec û Siyabend*, Tebrîz 1956; Pîremêrd, *Diwanze siwarê Merîwan*, Silêmanî 1953; Gêw Mukriyani, *Zembillîfiroş*, Hewlêr 1967; M. Mokri, *La légende de Bizan û Manîfa*, Paris 1966; nivîskar bixwe, *Le chasseur de Dieu et le mythe du Roi-Aigle*, Wiesbaden 1967; K. A. Bedîr Xan, A. de Falgairolle, *Le Roi du Kurdistan*, Roman épique kurde, Gap; K. A. Bedîr Xan, Herbert Oertel, *Der Adler von Kurdistan*, Postdam 1937; *Cegerxwin*, *Serpêhatiya Rewisê Dari*, Şam 1956; J. Blau, *le Kurde de Amadiya et du Djabal Sindjar*, Thèse de doctorat du 3e cycle, Paris 1973.

B- Bêjeya nivîskî yan Zanyari

Li kêleka girseya (kitle) gelê nexwenda, li ba kurdan



hergav komeke bijarte ya ronakbîrên gelek xwenda hebû. Ev yek hîn ji aliyê Ibn El-Esirê Kurd (630/1233), di Kamil (IX, 7-8) de hat nîşan dan û gelek caran di Serefname de û ji aliyê şahidên din ji hat gotin, weka Hacîci Xelîfe (1658) (li Adnan Adivar, La science chez les Turcs ottomans, Paris 1939, 92, 106 binêre) ya rêwî Ewliya Celebî di pirtûka gerrên xwe de (1682), ku bi heq li ber pirtûkxana gelek dewlemend a Abdal Xan, Seigneur kurde de Bitlis au XVIIe siècle et ses trésors (di bin vê seriyê de, li Art de A. Sakisian, di JA., CC XXIX, 1957, 253-76 de binêre) heyran dimîne. Mixabînan van ronakbîran tercîh dikir ku berhemên xwe yê zanyarî bi erebî, zimanê Qoranê, eger ev berhem li ser huqûq yan olzanî yan dirokê bana, binivîsîn, weka Ibn Xallîkan, 681/1282, nivîskarê notên jînenîgarîya kesên navdar, yan Abûl Fîda, 672-732/1273-1331, dirok û coxrafyazan; yan jî bi farisî, weka Şerîf Xanê Bidlîsî bixwe di Diroka Kurdan yan Serefname (1005/1596-7) de; û weka Idrîs Hekîmê Bidlîsî jî (926/1520) (li Bidlîsî, Idrîs binêre), ku diroka yekemîn a imperatoriya osmanî; Heşt Bihîşt, nivîsî. Helbestvanê mezin ê bi zimanê tirkî, Fuzûlî (1556), weka civakzanê nûjen Ziya Gokalp, dibe ku Kurd bin (li J. Deny, di RMM, LXI, 1925, 3 de binêre). iro jî, gelek helbestvanên bi zimanê erebî: Zehawî (1863-1936), Ehmed Sewqî, mirê helbestvanan (1868-1932), Resafî (1875-1945); civakzan Qasîm Emîn (1865-1908); nivîskarên roman

Eqqad (1889-1964), Muh. Teymûr (1892-1921) û birayê wî Mahmûd (di 1894 de çêbû) hemî ji rayê (esl) kurdî ne. Lê ev dirokanên ku bi farisî dinivîsîn, weka Muh. Merdûx Kurdîstanî, R. Yasîmî, Ihsan Nûrî, yan bi tirkî, M. N. Dersîmlî yan Yamulki, hemî Kurd in. Eger

têrature kurde (1952), cil-dekî stûr jî 634 rûpelan, piştî pêşgotinekê li ser Kurdistan û Kurdan (3-66) weşand. Wî merhele û teşeyên bêjeya kurdî (69-146) dianî bira me, pasê, notên giring li ser 24 helbestvanan (147-534) û listeke hinek hişk a 212 nivîskarên din



nivîskarên kevn hemî zimanên mezin ên misilman: erebî, farisî û tirkî, ji derveyî zimanê xwe yê dayikî, kurdî, dîzanin û bi wan dinivîsîn, nivîskarên cihan ên iro zimanên ewropî bi kar tinin: îngilîzî, fransîzî, almanî û heta rûsî, nemaze li Ermenîstanê ku tê de ermenî jî radigihînin wan. Bi rastî Kurd jî demên kevnar de gelek zimanan dîzanin û di gelek şaxan de dinivîsîn. Eynî nivîskar hostatiya xwe di helbest, dirok, zanistiyên fizîkî û mirovî û rojnamevanîyê de bi kar tinin.

Di 1860 de, A. Jaba, di Recueil de Notices et de Récits kourdes, 3-11 de notêke kurt li ser heşt helbestvanên bi zaravê kurmançî, ku hema hemî jî Hakkârî bûn, nivîsî. Piştî jî sedsalêkê kêmtir, Eladîn Sicadî li Bexdayê Histoire de la Lit-

(538-58) didan. Lê ew bitenê helbestvanên mirî yê Iraq û Iranê dide. Ji wê gavê, du berhemên nuhtir yê Marûf Xîznedar, Essai sur l'histoire de la littérature kurde contemporaine (bi rûsî, 1967, 232 rûpel) û Izzeddîn Mustafa Resûl, Le réalisme dans la Littérature kurde (bi erebî, 1968, 236 rûpel), ji derveyî lêhûrnêrînan din, pêşveçûna kurdo-lojîyê jî dema Jaba nîşan didin û zanînan me li ser vê bêjeya rojhilatî ku hîn li Rojavayê kêr hatiye nasîn baş temam dikin.

I - Rayên bêjeya kurdî û dema klassîk

Zanîndanê Jaba sedsala XVmin weka dema bişkiybûna helbestvanên pêşîn nîşan dide: Elî Herîrî (1425-95), sêx Ehmed Nîşanî ku bêtir bi

navê Melayê Cizri (1407-81) hatiye nasîn, Mela Ehmedê Batê (1414-95). Ew hevdemê hev bûn. Mîr Mihemedê Mukis, ku sernavê wî Feqiyê Teyran e dibe ku pêsiyê wan be (1307-75). Hemi ev mêjû (tarîx) divê ku bê n rast kirin û paş de hiştin; Bi rasti, D. N. Mackenzie, di gotara xwe Mela-ê Jizri and Faqi Teyran, di Yad-Name-ye Irani-ye, Minorsky, Tehran 1969 de, bi saya sistema abjad, qenc nişan da ku Melayê Cizri di navbera 1570 û 1640 de û xwendekarê wî, Feqiyê Teyran, di navbera 1590 û 1660 de dijiyan. E navdartirin Melayê Cizri ye, ku piştî Hafiz (791/1389) û Camî (817-98/1414-92) ku Diwana wî ji 2000 şewane (beyt) yan bêtir bû û ku li ba şêx û mellan, ji ba girseyê bêtir, pîr geleri ma, hat. Ev her gav di dibistanên qurani yên Kurdistanê de tê xwendin û li ser wî tê axaftin, lê metnê wî zor e. Ditinên wî yên sûfîtiya farisi ne. Diwana wî ji aliyê M. Hartmann, Das kurdische Diwan des Schêch Ahmed, Berlin 1904, 1922; Qedri Cemil Paşa, Diwana Melê, bi tipên latîni, di Hawar, N° 35-37 metnê ne temam, de; û nemaze weşana xweşik a Şêx Ehmed b. El-Mella Muh. El-Buhti El-Zivingî, El-Akad El-Cewherî fi serh Diwan El-Şeyx El-Cizri, 2 cild, 943 rûpel, Qamişlok, 1377/1958. Di bin metnê kurdi yê ahengkirî de, wergerandina erebî ya gotin-bi-gotin û yeke giştî û narintir, beytên dudu dudu, û di dawiyê de pêşandaneke sûfî hatine dayin. Melayê Batê nemaze bi Mewlûda xwe, ku ji aliyê von Le Coq, Kurdische Texte, Berlin

1903, hatiye nasîn. Feqiyê Teyran, ku helbesteke evîni ya nerm û xemgin li ser mamosteyê xwe Cizri nivîsi, nivîskarê gelek berheman e, nemaze Dîroka Şêx San'an, ku ji aliyê M. B. Rudenka, Moskov 1965, hatiye weşandin û wergerandin bo rûsî, û ji aliyê O. F. Qazî, Tebrîz 1967 bo Farisî.

Neweyê (cil) piştî helbestvanên ku ji aliyê Jaba hatin gotin bi Ehmedê Xani (1650-1706), ku li Beyazîdê rûnişt, hat nasîn. Ev nivîskrê destana netewî ya kurdi ya navdar Mem û Zîn e. Di vê berhema ku gelek çaran hatiye weşandin de, helbestvan destana geleri Memê Alan, ku ji aliyê R. Lescot, Beyrût 1942, û N. Zaza, Şam 1957 hat weşandin, stend û li gora rêzikên (qaide) bêjeyî yê klassik ji nuh de çêkir û wê bêtir îslamî kir. Ev helbesta ku ji 2655 perçeyên du beytan hatiye ava kirin pirtûka lîmêjê ya rast a neteweyîya kurdi ye. Eger metnê destana geleri ya Memê Alan

Heleb 1947, Hewlêr (Erbil 1954; wergerandin bo mukri ji aliyê Hejar, Bexda 1960; bo rûsî ji aliyê M. B. Rudenka, Moskov 1962; bo tirkî ji aliyê M. E. Bozarlan, Stembol 1968. Ji derveyî gelek perçeyên şewaneyên ku bi tirkî, erbeî û farisî hatine nivîsin, Ehmedê Xani nivîskarê takaneya (tevayîya gotinên zimanekî) biqafiyê ya erebî-kurdi ye ji: Nûbuhar, ku ji aliyê Yûsuf Ziya El-Dîn, El-Hadiyya El-Hamdidiyya fil lughâ el-kurdiyya, Stembol 1310/ 1892, 279-97, û ji aliyê von Le Coq, Kurd. Textes, I, 1-47, bi kopî hatiye weşandin. Xwendekar û paşiyê wî di dibistana Beyazîdê de, Ismailê Beyazîdî (1654-1709), ji gelek helbestên kurdi û ferhengê kurmanci-erebî-farisî, Gulzar, hiştine.

Di sedsala XVIIImin de, Şeref Xan (1682-1749), ji Cûlamêrgê, ji malbata mîren Hakkari, nivîskarê gelek şewaneyên bi kurmanci û farisî, û Murad Xanê Beyazîdî (1736-1778), xwendiyê



awayên wî yê cihê ku bo almanî, fransîzî, rûsî, rûmanî, inglîzî, ermenî û erbeî hatine wergerandin hebin, helbesta klassik a Mem û Zîn ji weşanên wê yê cihê hene: Stembol 1338/1920,

gelek helbestên evîni, hatine ditin.

Di vê demê de jî, lê li saraya waliyên Erdelanê yan li ba sultanên Hewramanê, tofeke çirisi ya helbestvanên

ku berhemên wan ên evîni yan olî bi zaravê gûrani ye xuya bû. Em Ehmedê Textî (nêzîkî 1640) û Şêk Mistefa Besrani (1641-1702), ku Minorsky nuhtir (1760) dibîne, bijimêrin. Dibe ku ew hevdemê tofke helbestvanên bi Xanay Qubadi (1700-1759), nivîskarê Salawatname, û Mahzûni (nêzîkî 1783) re be.

Ne mumkun e ku em hemî helbestvanên ku di sedsala XIXmin de dijiyan û ku berhemên wan di navbera her du serrên cihanê de hatin weşandin bijimêrin. Meriv dikare navên wan û lista berhemên wan ku di bêjeyên Xiznedar (218-20) û Resûl (228-32) de hatine gotin bibîne. Li ser helbestvanên bi gûrani, li Minorsky, *The Gûran*, binêre. Hin ji wan bi awakî dirêjtir ji aliyê Sicadi, weka di *Diroka bêje ya wî* (247-76), Mewlewî (1806-82) de, hatin lêhûrnêrin. Em bala xwe bidin ku mêjuyên ku ji aliyê nivîskarên cihê hatine dayin ne hergav weka hev in û em


zewqê helbestvanên kurd ji bo ji xwe re bijartina navekî derewin bibînin.

Ji helbestvanên sedsala XIXmin, ku gihandina wan bitenê olî bû, em dikarin nemaze vanan nişan bidin: Nalî (1797-1855), ku gelek gerriya û şewaneyan (beyt) bi kurdi, farisi û erebî nivîsin, û ku Diwana wî ya kurdi li Bexdayê di 1931 û li Erbilê di 1962 de hat weşandin; Salim (1800-66), û Kurdi (1803-49), weşna Hewlêr (1961), ku evîniya helbestên wî bi niştimanperweriyê dibîskive; Mehwiye Neqsbendî (1830-1909) dozînen (nazariyye) sûfi pêşan dide (weşana Silêmani 1922); bi vi awayî ji, Mirza Rehim Wafai (1836-92; weşana Hewlêr, 1951-61; 2 cild). Helbestvanên mezintirîn ên dawîya sedsalê ev in: Hecî Qadir Xoy (1815-92), ku helbestên wî yê niştimanperwerî hin ji gelek cûhanan germ dikin (weşana Hewlêr 1953; Bexda 1960); Şêk Riza Talabani (1842-1910), sûfi û satirik

(rexneya bi henek), hin iro ji gelek geleri ye û şewaneyan bi kurdi, farisi û tirkî nivîsine (weşana Bexda 1935 û 1946; li C. J. Edmonds, *A. Kurdish lampoonist: Shaikh Riza Talabani*, di *JRCAS*, XXII, Cile 1935 de, binêre); Salih Heriq (1851-1907); ê teşeyên kevî û naverokên sûfi (weşana Bexda 1938); Edeb; Evdelah Beg Misbah El-Diwan (1862-1917), Diwan, weşna H. H. Mukriyani, Rewandiz 1936, ji aliyê Gêw Mukriyani, Hewlêr 1960 û helbestên ku cara yekemîn tîne weşandin, ji aliyê M. Xiznedar, Bexda 1970; ev helbestvanezki narin û romantik e.

Em çend jinên ku rolekê di bêjeyê de lîzt ji nişan bidin: Mah Şeref Xanima Erdelan (1800-47), Sira Xanima Diyarbekrê (1814-65) û Mihrebana Berwari (1858-1905).

Dûmahî heye



Nedî û Danestan

S. B. Sorekli

Sal 2256 bû. Dû şer û cengên sedsalan, pê heznerkirin, stemkarî û ezotiya di nav merovan de, ku bû bûn sedema bêtarên salên dûr û drêj merovên li ser planêta erdê êdî dest ji xwûnmijiyê û neheqiyê berdabûn û li pîraniya beşên cihanê aştî û jiyaneke kêmezêde bê birçibûn hatibûn holê. Edî kesên ku nîkaribûna bixwendina pîrr û pîrr kêm bû bûn. Ger biçûk yan mezin, li her derê xwendegêh vebû bûn.

Li bajarekî biçûk yê hêleke cihanê ku di nivê duwem yê sedsala 20an de beşekî ji "cihana çarem" dikaribû bihata hesibandin, pîreke bi ûmir mezin, lê li ser xwe di odeyêke xanîkî çarqatî de rûniştibû û çirokeke xeyali ji torinê xwe re digot.

Ci hebû, çi tunebû, di demên kevnar de du welat hebûn. Navê yekî Beran û yê yekî Meraq bû. Serokê welatê bi navê Beran weli bû, feqî bû, Faris bû, pêzan û rêzan bû. Serokê welatê bi navê Meraq boke bû, jêhati bû, serdar bû, Erebbû, ew ji rêzan û pêzan bû.

Beran û Meraq, torinê minî delalo, bi hevûdin ketin û di şerekî heşt salin de milyonek û bêtir merovên hevûdin kujtin, û şer rane-westandin heta ku herdu

welat ji bi dizan ketin derdê. De di nav Beran û Meraq de beşekî welatekî bi navê Danestan hebûye. Dibêjine navê wî wisa hatibûye lêkirin, ji ber ku gelê wî welatî tum didaye, lê qe nedistan-diye. Navê xelkê ev welatê beş bi beş ji Nedî bûye.

De dema Beran û Meraq bi hev ketin, kurê pîrika xwe, Nediyan li hêla Beran hatin hêla Meraq û Nediyan Meraq ji bûn hevalên Beran. Gotinê naxwaze, şêrinê pîrika xwe, ku gellek kesên Nediyan hatin kujtin, bi sed hezaran sirgûn bûn û gundên wan hatin hilweşandin.

De dibêjine, ku helbestvanên Nediyan hin caran navên wek Şer û piling ji li milletê

xwe dikirine. De çirokek li nîk pîreka te heye, ku têde şer û piling dibin bindestên rûvî û çaqelan. De êdî nîzanim, ger pêwendiya şer û pilingên Danestanê bi vê çiroka din re heye, yan na. Li gor vê çirokê şer û pilingan sêweyên xwe yê sedsalan nîkaribûne biguherin, hema di nav dehlî û daristanan de êrişê yê li hamber dikirine û ya xwe bi ser dixistine. Lê dem û dewran tum têtên guhertin. Rojek hatibûye, ku rûvî û çaqelan ji xwe re dranine ku navên SUPERDRAN li wan bû bûye ji hinan kiribûne. Dema şer û pilingan bi sêweya xwe ya sedsalan êriş dikirine, rûvî û çaqelan hema devên xwe ji hev vedikirine. Berê ji dranên wan tirêjine



bûn, ku Şerif Paşaki wan ji li paş quncikeki maseya peyman aştîyê ê rûnenîsta, loma bûn pizot û ji rêxistinên xwe xweztin ku tiştek were kirin. Berpirsiyarên rêxistinên Nediyan, wan mêrxasan, otobês girtin, û çawa bo şevên roja xwe ya netewî, ku bi navê Nûro, yan Newro, yan Niro dihate binav kirin, derdiketine, yê ku şaş û mat dikirine şêr û piling û di çavên wan de yar û neyar li hev dixistine, heta yekcaran şêr li pêş çavê şêr dibûye rûvî û rûvî dibûye şêr. Dûvre ji nav devên rovi û çeqelan kelexeke gewravîn derdiketiye, ku herweha navê SUPER, ango : SUPERKELEBOX, lê bû bûye, û ew ji rovi û çeqelan ji xwe re dikirriye. Wisa ji şêr û piling bû bûne bindestên rovi û çeqelan. De êdî nizamim ger pêwendiya çiroka şêr û pilingên Nediyan û vê çirokê bi hev re hebin, yan na. Lê ez serê kurdalê xwe neêşinim; em di sa vegezin serê Beran û Meraqê.

Me got serê heyst salan ê rawestiya, Peymana aştîyê, ronahiya çavên pirika xwe, ê li bajareki welateki Arova bihata imze kirin, lê wek hercar Nediyan di sa pirr dabûn, lê tiştek nestandibûn. Tevî ku yek ji grîngtiriyên sedema şerê herdu welatan li ser Nediyan û welatê wan bû ji, ne paşaki wan, ne axeyek, û ne ji serpartiyeki wan li ser maseya imzekirina peyman aştîyê hebû, û ji ber ku, wek min ji şêrinê xwe re got, Nedi û Danestan yek ji sedemên şerê Beran û Meraqê bûn, yek ji bendên yekem yê peyman aştîyê ji ew bû, ku karbidestên herdu welatan Nediyan hev li dij hev bi kar neynin.



Lê Nedi weqa bêçare ji nebûn, delalê Pîrika xwe. Ji wan hejmareke ne biçûk li welatên Arova dijîn. De êdî hejmara rast kesek nîzane. Di hin pirtûkan de 50.000 e, di hinan de 500.000 e, di hin arşivan de nizimtir e, di hinan de bilintir e. De van camêran û çêjînan pirr aciz merov li hev dicivandin û dihanin şevên xwe, wisa ji kes û nekasên xwe li hev civandin û bi sedan otobêsan berên xwe dane ew bajarê Arovî, li kuderê peyman aştîyê ê bihata imze kirin. Berpirsiyarên rêxistinên Nediyan, weqa fidakar, zana û dilpak bûn, ku di cih de li hev kirin, ku hewceya sloganên cuda û alên partîyan bo vê munasebetê nake. Ew ê, 9.000-10.000 ji wan, tev li meydana bajêr bisekîniyan û bi dengê bangkirana : Em ji hene ! U ji ber ku em hene, divêt di peyman aştî de tiştek li ser mafê me ji hebe.

Di meş û civinên wisa de, granbihayê li ber dilê pirika xwe, gellek rojnamevan tî û pirsan dipirsin. De di nav Nediyan Arova de gellek kesên xwendevan û pêzan ji

hebûn. Serekên rêxistinan merovêk ji nav Nediyan bi-jartin, ku bi 3-4 zimanên Arovî wêk zimanê diya xwe dizanibû. Herweha dizanibû li goreyê serên Arovîyan bersivan bide. Dema rojnamevaneki pîrsî : Hûn bo çî, neh-deh hezar ji we li vir civiyane ? Yê Nedi bizîmaneki xweş, bêyi ku biqire, yan biricife, got : Bi hezaran ji me ji ber şer reviyay welatên Arova, bi sedhezaran ji me li war û welatên din in, gundên me hilwesiyay, malên me şewitî. Ger ev peyman aştîyê nikare welateki serbixwe bide me, ger nikare azadiyê bo me misoker bike, bi kêmasî, bila di peymanê de bendek hebe, ku rê bide hemî Nediyan li dervayê Danestanê, da vegezin warên xwe yê berê. Hûn li welatên Arova ji dibêjin, ku yê biyani divêt vegezin welatên xwe. De pişt me bigirin; em ji dixwazin vegezin welatê xwe, pişt me bigirin, ku bila di peymanê de bendek li ser me ji hebe, bo em biçin welatê xwe. Ev merovê, ku dizanibû çawa bi xîfe û ew berpirsiyarên zana û aqil-

mend û ew 10.000 mêrxas
 û jinên çê ne tenê dilên
 gelên Arova hanin hêla xwe,
 lê hejmara wan roj bi roj
 bêtir bû û bi hemî sêweyan
 alikariya hevûdin kirin, û ji
 wî bajari neçûn, ta ku di
 peyman aştî de bendek hat
 imze kirin : Gundên Nediyan
 yên hatini hilweşandi ê disa
 werin lêkirin, her kesê Nedi

ku iroj ji welatê xwe dûr e,
 mafê xwe heye bê gels û
 asteng vegere warê xwe.

Erê, berxê pirika xwe !
 Tev ku Nediyan welatê xwe
 hê rizgar nekiribûn, tev ku
 gellek astengên wan hê
 hebûn ji, lê li vir cihanê ew
 bêtir naskirin û ji wan re li
 çepikan xistin. Dilşa û kêf-

xweş bi hezaran ji wan disa
 vegeriyan welatê xwe, bi
 xwe re sinet û zanibûna ew
 li Arova fêri wan bû bûn
 birin û li welatê xwe dest
 avêtina gavên nû kirin. De
 rabe, sivikê mini delalo,
 rabe; dem dema razanê ye !

(VIII. 88)

Veresandin

S. B. Sorekli

Ji çanda hemî gelan hej dikim,
 lê ya gelê min bêtir li xweşiya dil tê
 û dixwazim zaroyên min bi wê rabin,
 lê :
 COCA COLA,
 RAMBO,
 DISCO,
 MICHEL JACKSON,
 20.000 KILOMETIR DURBUN
 û hezar tîst û pîrs û merseleyên din
 dibin diwar.
 Ez baş dizanim,
 zû dereng em ê ji hev biqetin,
 tenê û di nav çanda zarokiya xwe de
 ez ê bi ser xwe veresim.

Xwendin


Bixwêne !
 Ci bixwênim ?
 Pirtûka han.
 Li ser çi ye ?
 Li ser welatê me.
 Naxwazim.
 Kura, min got bixwên !
 Ne bi zimanê min e.
 Bixwêne, lawê keran, yan, ..
 Ez ê bixwênim,
 lê ne ji dil.

Têkdana nexseya Kurdistanê

Li Brukselê monumaneke mezin bi navê Atomium heye. Ew ji çend gilokên mezin ku awayê atomê temsîl dikin pêk hatiye. Gelek tûrist tên serdana (ziyaret) wê. Di nav yek ji van glokan

de nexseyeke (xarite) cihanê ya gelek mezin li diwar, li ser xaliyê kesk a xweşik hatiye çêkirin. Weka ku xwendevan li jêr dibinin, Kurdeki bênav nexseya Kur-

distanê bi pênûs (qelem) di nav ya Rajhilata Nêzik de çêkir. Pîsti çend rojan, ev nexse bi kêr û mixan ji aliyê (?) ewqas hat têt dan (xera kirin) ku xali bixwe perçe bû.-



Mesele û metelokên kurdî

Bi zaravê kurmancî

Agir ber piyê wî dibe av.

Aqilê sivik - barê giran.

Aşê nezana xwedê digerine.

Av dikeve cihê teng, deng dide.

Barê aqila, piştî kêmaqila.

Bêje rast, razê rast. Bese minanî mirişka xwe bidî enişka.

Ber baranê revim, bin zîpikê ketim.

Berf dihele, çiya dimîne.

Caw bû kitan, dew bû derman.

Çeşik mezin bû, disa ker e.

Cilê xwe şil kir beriya baranê.

Cima razê newala kûr, çima bivînim xewnê dûr ?

Darê di bin xwe da qut meke.

Dar li kewê neket, kew li darê ket.

Defa ber keran e, çira ber koran e.

Dem tiryê tirs şirin dike.

Eger tu dixwazî kurê xwe bikî mêr, bike şivan, lê zû bine mal hê nebûye heywan.

Em ne ji malekê ne, lê ji halekê ne.

Ev çav ronahî nade vî çavî.

Ez axa, tu axa, kî golika bibe nav baxa ?

Ez hatime daweta te, tu hatî dizîya min.

Bi zaravê soranî

Agirê sûrê - le xom dûrê.

Asîni sard ekutê.

Asman stûnî ewê.

Aşyaw girmey dê û ard diyar niye.

Baxewan le wextî tirêda guyê girane.

Baran ebarê - aşî egerê, baran nabarê - cûti egerê.

Bê zorna heleperê.

Be derzî bir helnakendrê.

Co be diwara hel egêrê.

Caw le çaw şerm ekat.

Ceple be destêk lê nadrê.

Cira şewqî bo xoy niye.

Dar kirmî le xoy nebê, hezar sal ejî.

Dengî dehol le dûr xoşe.

Dengî heye w rengî niye.

Dest dest enasê.

Eger goşt girane, nexwardîni herzane.

Elêy agiri bin kaye.

Em kaseye bê jêr kase niye.

Ew çawe kuyêrbê, ke xenîmî xoy nenasê.

Gul bê qincik na bê.

Giya le ser bincî xoy şin ebê.

Berhevkirin : O. Celil, C. Celil
Weşanên Ronahi

X e b a t a m e

23-25 Ilon

Festivala 2min a Ewropî ya "The World We Choose", li Parc des Expositions, li Brukselê. Em sê rojan bi raxistina belgeyên kurdi besdari wê bûn.

14 Ciri

Seva xwendekarên Zanîngeha Louvain-La-Neuve. Em bi dilanên kurdi û raxistina pirtûkan besdar bûn.

17 Ciri

Me filmeke vidêo ya belgeyî (dokumentêr) ya li ser nijadkujiya Halabca, li

Zanîngeha Louvain-La-Neuve, nişan da. Vê filmê bala nêrevanan pîrê kîsand û wan gelek pîrsan li ser Kurd û Kurdistanê pîrsin. Li ba filmê jî, me belgeyên kurdi raxistin.

26 Ciri

Me cardin filma Halabca li Brukselê, li komela Têkoşer, nişan da. Gelek kes, jî netewahiyên (cinsiyyet) cihê, besdari sevê bûn. Ji bo ku Dr Aubin Heyndrickx nikarî bû were bîaxîve, hevalê me Jean-Pascal Zanders, ku pirtûkekê li ser çekên şimik dinivîse, axaftineke gelek xwes li ser bikaranîna van çekan û pîrsa kurdi çêkir (li-

rûpel 10 binêre).

12 Teşrin

Em besdar bûn seva piştgiyaya Tevger, li Köln, û me silavnamekê şand.

19 Teşrin

Em besdar bûn seva Komjîn, li Duisburg, û me silavnamekê şand.

Weşan

Me nivîsarekê li ser pîrsa penaberên (multecî) Kurdistanê Iraqê li Tirkîyê, di kovara giring Pax Christi ya meha Ilonê de, nivîsi.

Génocide à l'arme chimique

au KURDISTAN d'Irak

à


HALABDJA

Film - video et débat

Présentation : Prof. A. Heyndrickx, toxicologue
Date : mercredi 26 octobre 88 à 19 h.
Lieu : Têkoşer
4, rue Bonneels à 1040 Bruxelles
métro Madou - Place St. Josse

Organisateur : Têkoşer, Union des Travailleurs et Etudiants Kurdes
en Belgique
4, rue Bonneels,
1040 Bruxelles

FESTIVAL EUROPEEN




the World
We Choose



HEYSEL
23-24-25 sept. '88

Têkoşer'den haberler



23-25 Eylül

Brüksel şehrinin, Parc des Expositions da düzenlenen 3 günlük "The World We Choose" 2. Avrupa Festivaline kitap ve belgesel yayınlarmızla katıldık.

14 Ekim

Louvain-La-Neuve Üniversitesi öğrencileri tarafından düzenlenen geceye folklor ve kitap sergimizle katıldık.

17 Ekim

Halabca katliamı üzerine düzenlenen belgesel bir filmi Louvain-La-Neuve üniversitesindeki bir salonda gösterdik. Film'den sonra, Kürdistan ve Halabca üzerine soru-

lan soruları cevaplandırdık. Elimizdeki kitap ve belgeleri sergiledik.

26 Ekim

Brüksel'deki Têkoşer lokalinde yine Halabca üzerine hazırlanan belgesel filmi, değişik uluslardan oluşan bir grup izledi. Dr Heyndrickx (Halabca'ya giden Belçikalı Dr) geceye katılma fırsatı bulamadığından yerine Jean-Pascal Zanders katıldı. Kimyasal silahların tarihçesi yapısı gazlarını üreten ülkeler ve tehlikeleri üzerine geniş bir bilgilendirme yaptı. Sorulan soruları cevaplandırdı. Kendisi Kimyasal Silahlar üzerine uzun ve geniş açıklamalar getiren bir kitap hazırlamaktadır.-

12 Kasım

Almanya'nın Köln şehrinde Tevger tarafından düzenlenen geceye katıldık. Destekleme mesajı sunduk.

19 Kasım

Almanya'nın Duisburg şehrinde Komjin (Kadınlar Birliği) tarafından düzenlenen geceye katıldık. Kendilerini desteklediğimizi bir mesajla duyurduk.

Yayın alanında

Türkiye'ye sığınan Iraklı Kürt Mülteciler üzerine hazırladığımız bir yazıyı "Pax Christi" dergisinin Eylül ayı sayısında yayınlattık.

